
*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*


*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 35

# Gelo! Sûbarî Aşûriyên Resenin?

Rojhilata Navîn warê fêş û elawetane. Li dor sala 2300 b.z. Akkadiyên biyabanî herêma Mêzopotamiya (Îraqa niha) talankirin, dewlet-bajarên Sûmeran xistin bin destên xwe û cara yekem padîşahiyeka nawendî, xwediya daxwazên emperatorî avakirin. Ji wê demê da desthilata emperatoriyan li Rojhilata Navîn berdewam bû. Bi encama şer û pevçûnan pir rastî wenda bûn; hin caran qet nehatin tomarkirin, hin caran ne bi temamî hatin tomarkirin û hin caran jî serdar û dîroknivîsên wê demê - ji ber sedemên êlîtî, neteweyî û ayînî rastiya bûyeran guhartin û tezwîr kirin. Di çarçewa vê mijarê da arîşeya Sûbarî û Aşûriyan derdikeve holê. Gelo ev çi arîşe ye.

## Geřek di jêderên dîrokî da:

Da ku em rastiya Sûbarî û Aşûriyan zanibin, divêt em lêkolînê di warê nasname û erdnîgariyê da temam bikin. Emê niha tiştên here girîng ku dîroknasên rojavayî û yên ereb di vî warî da gotine bidin xuyakirin; û ne tiştên ku dîroknasên Kurd gotine.

- Hary Sags dibêje: Sharru Kin I (*Sargonê Yekem* ê akkadî ji 2371 heya 2316 serdarî kiriye) êriş bir herêmekê bi navê *Sûbartû*. Ev nav ji herêmên bakur ra dihate gotin ku li rojhilatî Sûriyayê dikevin. Ji beşê navîn yê vê herêmê ra "*Aşûr*" dihate gotin[1].

- Gernot Wilhelm dibêje: Herêma ku paşê bi navê "*Aşûr*" hate naskirin û herêma rojhilatê çemê Dijle ya bakur û hin beşên welatê navbera herdu çeman yê bakur, cara yekem di navbera 2230 - 2090 b.z. kete bin desthilata akkadî. "*Sargon* - avakirê padîşahiya Akkad - yekem kes bû ku şer li *welatê Sûbartû* kir"[2].

- Gernot Wilhelm dibêje: "Navê erdnîgarî "*Sûbartû*" (bi sûmerî: *Sûbir*) ... di bingeha xwe da ji beşekî herêma rojhilat çemê Dijle yê bakur ra dihate gotin. Di pey ra mebest bi vî navî firehtir bû ku êdî welatê *Aşûr* û bakurê Mêzopotamiya girte nav xwe. Piştî wê, di nivîsên babilî yên nû da bû navekî wêjeyî ji bo *welatê Aşûr*"[3].

- Muhemed Beyyûmî Mehran dibêje: "Kelîja padîşahê akkadî *Sargon* gihîşte *Sûbartû* li bakur-rojhilatê Îraqê, ewa ku ji çemê Belîx da li rojava heya bi çiyayên Zagros li riojhilat dirêj dibe"[4].

- Muhemed Beyyûmî Mehran dibêje: Pir şoreş û serhildan li dijî padîşahê akkadî *Sargonê Yekem* pêkhatin ku ji aliyê cemawerê deşta *Sûbartû* va hatin piştgirîkirin. Hêrsa şoreşgeran

gihîşte wê astê ku paytextê *Akkad* dorpêçkirin. Lê belê *Sargon* bi leşkerê xwe li dijî wan berxwedan kir û dikarîbû wan belav bike û tolê jî ji bajarên wan hilde"[5].

- Jean Bottéro û hevalên wî: Derbarê *Puzur Aşûr*, padîşahê aşûrî yê herî kevin dibêjin ku pêşiyên *Puzur - Aşûr* navine ne samî hilgirtibûn û dibe ku ev hin rêveberên *Sûbaran* (*Subarian*) bûn. Têgîna *Sûbartû* têgîneka wisa ye ku di jêderên babilî da ji bo herêma *welatê Aşûr* tê gotin. Ev têgîn ji bo rûniştivanên samî (yanê aşûrî) û yên ne samî li wê herêmê bê cudahî dihate gotin"[6].

- Amir Suleyman û Ehmed Malik El-Fityan: "Navê *Aşûr* li beşê bakur yê Îraqê, pêş hezarsala sêhem, ne naskirî bû. Ji rûniştivanên vê herêmê ra "*Sûbarî*" û ji welatê wan ra "*Sûbartû*" dihate gotin. Dema ku *Aşûrî* hatin vê herêmê êdî navê *Aşûrî* û *welatê Aşûr* bêhtir belav bû. *Sûbarî* di nav *Aşûriyan* da nixumîn (hatin pişaftin) û hinek ji wan çûn herêmên çiyayî"[7].

- Muhemed Beyyûmî Mehran: "*Aşûrî* nehatin navçeyeka vala. Ew hatin herêmekê ku neteweyeka din berê li wir bû. Ji wan em *Sûbartû* nasdikin, ewên ku berê li herêma navbera Dijle û Zagros bûn. Ew bi ti awayî ne samî ne. Hîngê em dikarin bêjin, ku bi sedema hatina pêlên Samiyan ji rojava yan başûr da, yan jî ji herdu aliyan da, ku ber bi herêmê da dixuşiyan, wê dijberiyek di navbera wan û rûniştivanên bingehîn yên *Sûbaran* da pêkhatibe. Ev dijberî bi serketina ewên ku hatibûn bi dawî bû û li wir bi cih û war bûn. Tevî ku *Babiliyan* pir cudahî nedixistin navbera *Aşûrî* û *Sûbaran* û ew wek yek nijad didîtin. Belkî jî sedema wê ew be ku bi derbasbûna deman ew herdu nijad ketin nav hev"[8].



(Emperatoriya Aşûr - Herêma sor Sûbartû ye, nawenda welatê Aşûr)

- Amer Hanna Fettûhi gotiye: "Aşûriyên pêşîn miletekî asiyawî ye ji nijadê Hindo-ewropayî û navê wanî kevin ku pê serbilindin "*Şûbarû*" yan jî "*Shubaru*" (*Sûbartû*) ye. Ev hin êlên revend, şervan û berber ji herêma çiyayên Bedlîsê bûn ku bi zor ketin herêma bakurê Mêzopotamiya ku cotkarên *Sûmeran* hên ji nîveka hezarsala sêhem ya b.z. da li wir rûniştibûn û bi cih û war bûbûn"[9].

- Amir Hanna Fettuhi ji peyvên dîroknas Rizq Ellah Guneyme wergirtiye: "Lêkolînên ku zaniyarên Almamnan di salên 1903 û 1914 kirin piştrast dikin ku rûniştivanên kevin yên herêma *Aşûr* ne samî bûne...ew *Şumerî* (*Sûmerî*) bûne"[10].

- Amir Hanna Fettuhi: "*Aşûra* ku dibêjin, di dema xwe da, *Sûbaran* li ser axa welatê *Sûmeran* ya çandiniyê avakiriye. *Şûbarî Aşûriyên* pêşînin, ew rûniştivanên konan ku li herêmên çandiniyê yên *Sûmeran* li bakur belav bûbûn. Hejmara wan di navbera çend sedsalan da ji hejmara *Sûmeran* li *Aşûr* û *Nînewa* bêhtir bûbû"[11].

## Hin encamên dawî:

Ji agahdariyên derbasbûyî em digihînin van encaman:

**1 -** Li dor nîveka hezarsala sêhem b.z. ew herêma ku paşê bi navê *Aşûr* hate naskirin û bû nawenda padîşahî û di pey ra emperatoriya *Aşûr*, navê wê "*Sûbartû* = welatê *Sûbarî* /*Şûbarî*" bû, û ne "welatê Aşûr" bû.




**2 -** Welatê *Sûbartû* yê nawendî ji nîvê bakur yê Herêma Başûrê Kurdistanê ya niha û bakur-rojhilatê Sûriyayê (yanê herêma rojhilat ji Rojavayê Kurdistanê) pêkdihat.

**3 -** Rûniştivanên *Sûbartû* yên pêşîn (*Sûbarî*), ne nijadekî samî biyabanî ne, ti peywendiya wan ji hêla nijad û çandê da bi *Akkadî (Babilî)*, Amûrî, Aramî û Ereban ra tineye. Dîrokzanan ew hin caran wek asiyawî û hin caran wek Hindo-ewropayî (ariyanî) bi nav kirine. Peywendiya wan ya erdnîgarî, çandî û nijadî bi *Horiyan* (*Hûrî / Khûrî*) ra heye.

**4 -** *Sûbarî (Şûbarî) Aşûriyên* pêşînin. Şaxekî ji *Amûriyan* (*Amûrû*) welatê *Sûbartû* talan û dagîr kirine û bi rûniştivanên bingehîn (*Sûbaran*) ra tev li hev bûne. Ev pêkhata nû ji (*Sûbariyên* zagrosî yên bingehîn) û (*Amûriyên* ku bingeha xwe biyabanî ne) bi navê "*Aşûr*" hate naskirin.

**5 -** Padîşahên pêşîn yên ku li vê pêkhata neteweyî û çandî nû li welatê *Aşûr* (*Sûbartû*) serdarî kirin û bi navê *Aşûrî* hatin naskirin, ne samî bûn; ew ji *Sûbariyên* resen bûn (yanê *Aşûriyên* resen).

**6 -** Navê "*welatê Aşûr*" du maneyên xwe hene: Maneya kevin tê wateya welatê *Sûbariyên pêşîn* pêş hatina talankerên amûrî. Maneya nû tê wateya welatê wî gelê ku bi encama pişaftina *Amûriyên* talanker li gel rûniştivanên bingehîn (*Sûbarî*) pêkhat.

Niha pirs ewe ku çawa ev guhartina maneya navê Aşûr pêkhat?

Evê mijara me ya dahatî be.

Çarşemb, 18.11.2015

# Jêder

---

[1] Hary Sags: Mezinahiya Aşûr, rûpel 29.
[2] Gernot Wilhelm: Horî, dîrok û şaristaniya wan, rûpel 29.
[3] Gernot Wilhelm: Horî, dîrok û şaristaniya wan, rûpel 29.
[4] Muhamad Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqa kevin, rûpel 142.
[5] Muhamad Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqa kevin, rûpel 131.
[6] Gean Bottéro û hinên din: Rojhilata Nêzîk, şaristaniyên destpêkî, 188.
[7] Amer Suleyman, Ahmed Malik El-Fittyan: Semînar di dîroka kevin da, rûpel 143.
[8] Muhamad Beyyûmi Mehran: Dîroka Îraqa kevin, rûpel 325.
[9] Amer Hanna Fettuhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 99.
[10] Amer Hanna Fettuhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 99.
[11] Amer Hanna Fettuhi: Keldan ji destpêka zeman, rûpel 49.